II Beşê Kurdî

Be Firyakeyn-Muawenet

New'ê beşer le rojî ezel ta ebed yek muhtacî muawenetî yek in. bê muawenet hiç çîştî qabil niye bête wucûd. Heta dewlet daima muhtacî muawenetî millet e. Eger millet esker neda, eger millet pare neda, eger millet tekalif neda, esasen dewlet nabite wucûd. Herweku dewlet muhtac e be millet; miletiş muhtac e be dewlet. Dewlet eger ewî xera beka, cezamendeê neka, ewî çakeka mukafatî neda, eger wek bawek derheq be ewladî ke raiyete muşfiq bitî, dewyane ew dewlete qabil niye bejî. Diqet le her çîştî bifermiwin, mutelqe be muawenet erzî endam naka. Temamî diruxti heta dite wucûd. Çend muhtacî xidmete baxî sadise semere însan û erûbaxî xoy serf dika ta semere eda wexte le ber zehmetî însan ruhî der çî emane delalet dikeyn ke hemû çîşt bê muawenet nayêt wucûd. Suzay duruxti ke le sehra da rewawe ewiş bê muawenet nehatuwe wucûd. Barî teala eger baran bianarî eger roj dirnexat qabil niye ew Xuday nabite wucûd. Însaniş weha ye. Weqtî ke dewletî Elman legel dewletî Frnsa herbî kerd. Frensayî mexlub kird. Feqet herbe mexlubkirdin kifayet nekird. Wehay tesewur kird ke eger pareyekî zorî be nawî tezmînatî herbiwe hemil bekata ser Frensa le jêr ew bare da ta yewmî nefxî sûr, necatî nabî. Meeheze ew tesewire ke Elman kirdibuye. Eger çî derheq be memleketitir qabil bû ke hasil bî. Feqet legel miletî Frensa, ew tesewire muqabeleê nekird. Miletî Frensa ewinde meftûnî dewletî xoyan ewinde mecbûrî bika ke

le zerfî du manga ew pare zor e peyda kird û xoyan li dest ew dişmine bêemane necat da heta jinanî goriyan nema hemûyan dabe îae û necatî

Xoyaniyan da û meşxulî tereqî xoyan bûn ke îmro Fransa ewinde tereqî kird weke eqîl heyran e be defter sabit e ke her salî bîst hezar kes le Fransa dimirit û her salî bîst hezar nufûs zimmî nufûs Elman debî. Eger îmro Elman legel Fransa dubare herb bi takî dilî ke Elman faîq debî. Çunke eger kesretî nufûs sebebî xelege buwaya, bo çi Rusya Mexlubî Japon dibû? Belî himetî rical, teqlê cibal eger muawenet bê hemû çîst qayil e bête wucûd. Êsta Kurdekan eger textî himet bikin, muheqeq edebiyatî man tedwîn dikirî, zibani man islah dikirî wek xelq dibin be sahibî îsm û şohret. Xulasa medeniyet rûdikate ême û şîtiden kî bûd manendîden. Ewî ruyel eyn be nezerî nîkebî nazanî ke îmro xetrî muslîm çend mutereqî ye. Çunke rûbehr fabrîqeyek dikît. Temaşa dikît le gewre ta kuçik mudîranî ew fabrîqe hemû gawir in. Serapa îhtiyacatî îslam, îmro gawur defî dika. Îmro dewlemendî dunya gawur e esbabî emane. Çunke gawurekan se'yî kirin û le muawenetî dîndaşî xoyan qusûr naka. Ewî paredare salî çend telebe be pare xoyî sewqî ewrûpay deka. Bo xatirî fêrî ilm senet bî. Ême îslamekan her min bem û kesîtir binî teqîb dikeyn. Heta le ser em chwale maweyn qetiyen tereqî nakeyn xo eger îtifaqîman Kurd û dostîman daye destî yekîtir be Xuda le zerfî du sê sal da be wasîte îmdadî rehmaniyetî Muhemedul Mustefa sel'im, le eqwamî saîde ziyatir dibên be peyaw.

Silêmanî /Ebdulkerîm

Tefsîrê Şerîf

Û hûn (gelî bawerkeran!) bi gotina Xuda û Peyxember wî bikin û hûn(bi hev ra) têkoşînê nekin. (Eger hûn bi hev ra xir û cir bikin) wê îdî hûnê ji hev bê zar bibin û quwweta we ji hev keve, hûnê belav bibin. (Sure-î Enfal, ayet: 46)

Xuda ve nebî bigerin we nekevne hev, paşî quwweta we, şewketa we ji dest we diçe... Komela Îslamê heya Hindistan we Çîn we Turkîstan we Qerim we Qazan hukum dikira, di nav vê wîlayetan da çiqas cî hebû hemî di dest Mislîmanan da bû, bi keyfa xu didan û distandin. Eskerê wan tû derek ne dişikesta. Alema wan roj bi roj di cihê di bilind dihate çikandin, tû cuzek wan ne dihate nefirandin. Mêrê di wan wekî gelîyê di bilind, wekî hîsarê di qaîm, wekî çiyayê di mezin. Mil didane hev, quwweta dijminan dirêtin. Welatê wan digirtin, di rêya dîn da xu qurban dikirin.

Ew welatê kû digirtin, têda edaleta mûslîmanî îcra dikirin li kesek te' dayek, neheqîyek ne dikirin, bajar ava dibûn, ehlê qenc digîhan, di medresan de her îlm we huner dihate xwendin.

Îro ew alimê kû mûslîman bi wan fexrê dîkin wekî Îbn-î Sîna, Farabî, Razî, Îbn-î Bace, Îbn-î Rûşd, Îbn-î Tufeyl li wê wextê da gîhane di hîkmet, di hey'et, hendese(geometrî-çev) we tîbbê da we di îlmê dî da yekta bûne. Gava kû Fexfûrê(qiralê) Çîn xeberek xelîfeyê Ebbasî bibihîsta ziravê wî diqetîya. Împaratorê di Frengan li ber mûslîmanan diricîfya.

Mehmud Xeznewî, Melîkşah Selçûqî, Selahaddîn Eyûbî, Tîmurleng, Fatîh Sultan Muhammed, Sultan Suleyman jî xizmetê di mezin kirine. Her çiqas bi xu jî darê dunyayê çûne, lê

xizmeta wan di qelbê mûslimanan da cî girtîye, tû car jibîr nabe.

Gemîyê di mûslimanan di Behra Sipî da we Behra Sor da we Behra Umman da quwwet we heybetek wûsan peyda kiribû kû kes nekarîya pêş muqabilê wan bibe.

Mûsliman îro jî dîsa ew mûsliman in. Ger wan mûslimanan in, welatên kû têda rûniştine ji bav û kalê wan maye, hejmara wan ji sêsed mîlyon kêmtir nîne, eqîda wan temam e, ji her qewm we milletê bêhtirîn, ji mirinê natirsin, mirin li ba wan şaşî ye, pêş bi dunyayê nakin. Jîn û mirin li ba wan yek e.

Xereda wan ji dunyayê sîyaneta (muhafeza-çev.) dîn û namûs e, hiştina nav û hilanîna zêr nefîne(naxwazin) ew dizanin kû ew dunya namîne ewê bimîne.

Ev Qur'an kû li dest mûslimanan da ye her gav redda ewan ji xerabî dike, tiştê di qencî ji wan ra dibêje.

Mûsliman di nefsa xu da şan û şerefek wûsan dibin kû her gav ji alem bilindtir dibin, Xudayê Teala ji kerema mizgînaha di Qur'an'a xu da daye ji bo wî qasî mûsliman naxwazin kû biçine bin nûfûza kesek hez dike, ew nûfuz giran be hez dike bila sivik be.

Bin eqîde ê temamî Mûslimanan wûsan li hev girêdaye wera pêçaye kû yek ji wan(eger Xuda neke) bikeve bin nîrê xeyrê xu çaresîyek we rezbelîyek dizane.

Dewle li ser dîn da ew alem weha kû mûsliman bi dest dîtin bi sebeb bilindîya wî, mûsliman derheqê qebîlyeta îlmê da xu ji hemî qewman we mîlletan pêştir dibîne. Lakîn îro mûsliman ji wê heqîqetê gelek dûr ketine we ji xebata berê paş mane. Di îlmê da, di sen'et da ostayê alemê bûn, îro şagirdê xelkêne. Xelk te'nan li wan dide dibêje di wan da tû qebîlyetek

tune, welatê wan kerî kerî kirin li hev bela kirin.

Hal ew e ku ew yekî muhalifê dînê wan be. Bi tiyîya wan âre ji bin hûkmê bêdînan derketin we sozê wan qebûl nekirin, dînê me ji me ra emir kirîye.

Dunyayê da çiqas millet û dewlet heye hemî dixwazin ku di dîn da û di cins da her kes tayê millet û cinsê wan be.

Nexwu Musulman ji mizgîna Xwuda bê xebere, nexwu pir girde (mezine) ku dibêjî Xwudan vî erdî, ebdê dimin salih dê bibe.

Nexwu, xafilin ji wê rojê ku Musulman dê serdestê temamê alem bibî, nexwu di rêya dîn da pêş muqabil bihiştê firotina malê xwu, canê xwu bîrûwe(feda) kirine.

Musulmanî yek e, bi dest anîna îlim ve hêzê da heqîqeta tehqîran ji bo çîye, roj bi roj kêmbûna quweta musulmanî we zêdebûna şewqeta filistanî, bihev neketina hakiman we serokê eşîran e.

Hakim û serekê eşîren ji bo jîna xwu, ji bo rehetîya xwu, xelkê berdidin hev, malê feqîran talan dîkin, pez û dewarê wan dibin, her çi zulm ji dest wan tê dîkin, kes lê napirsî, mela û şêx emrê Xwuda ji wan ra nabêjî, ji bo qetek nan emrê Xwuda bîra xwu naynin. Bi şev û roj nav wan da mêr kujtin, talan birin, jin revandin rewac digerî, bila sebeb birayê xwu ê musulman dikujin, ji Xwudê natirsin, ji nebî(pêxember) şerm û heya nakin.

Ev di wî halî da hev diqelînin, dijminê dîn keys lê têtê, bazdide ser wan jin û zaroyê wan serjê dike, welatê wan digire, ewê sax mayî rezîl û risawa dike.

Ev e, ji rûyê bêtîfaqî, di qîrêna ha da çi bi ser musulmanan da hat, çiqas keç û kurê reben birin. Çiqas xaniyan şewitandin, mizgeftan we yektan kirine

dêr û naqusan(çan), lê aliqandin. Eger ew tiştê ku dijminê dîn bi ser musulmanan da anîye em binivîsin we herçî ku di dilê wî da ji îmanê zerreyek hebî dixunin, çawan birêjî ji heybet wî wê wekî çira bihelî.

Hakim û mîrê musulmanan, tema-yîya malê dunyayê wan ji musulmanî derxist, şeref û mezinayîya bav û kalê xwu ji bîra wan bir, xuna musulmanî di wanda nehişt. Ev mîr û hakim daha jibo malê dunyayê, ji bo jîna dunyayê, ji bo navek hişk çûn xwu avêtin bextê dujminê dîn.

We bi quweta wan birayê xwe yê musulman qelandin, dijminê dîn paşê wan jî girt we çîsas kir, welatê wan girt yek ji wan sax berneda. Eva! Hûkumeta Endulus, bi vî hawayê çû di nava rojek da sêsed hezar musulman serjêkirin, îro ji bo derman musulmanekî li wê tune ye.

Paşê wî Hindîstan tê, li Qerejê (Qereçî) mîr û hakim ketine hev, hakimîya musulmanan ji dest wan çû "Îngiliz" girt, niha li jêr te'dahîya wî dinalin.

Paşê wî Turkîsatan, Qafkasya, Qerim, Qazan, Qers, Erdexan, Betûm, Cezair, Trablus we Rumelî çû, musulmanê wan deran jî şerpeze bû. Ew mîr û hakim û Melayê kêmaqil ku ji bo keyfa xwu, hewesa xwu benê musulmanî şikênandin, milleta xwu jibîr kirin, ji bo hîsset û şerazayîya cinsê xwu nexebitîn, aqîbet wenda bûn, cezayê xwu dîtîn, feqet çî fayde ku musliman li bin piyê dijminê dîn da man, çara xelasbûnê tune.

Eger mirov dema Quran'a Xuda li paş navêtina, ferz Xuda înkâr nekirina, neketana hev, bi şev û bi roj li xerabîya hev negerana, yek dil bibûna, pişt bidana hev, dîne xwu, erzê xwu parastin bikiran, ew aqîbeta pîs bi ser

wan da nedihata, di dunya û axîretê da rûreş nediman.

Wellahî, billahî, tellahî eger musulman, mîr û gavan û şivanê wan yek dil we yek ziman bûna, di dunya û axretê da dê serfiraz bûna.

Heyf û sed heyf musulmanî dema bê qedir û qîmet bimîni, hingê ev halet di me da bî, qencî bona me kirin gelek zahmet e.

Esasê dîne me tîfaq e, lazime em tîfaq bikin, rêya musulmanî bigirin. Îro navê me musulman e feqet ji musulmanî dûrin, hey musulman yek bibin, dîn ê dijminan dê biçin, çawa ku birayê di me çûn.

Eger di me da musulmanîyek, xîretek, namusek, arek ji bo jin û zaroyê me di dilê me da hemiyetek heye, hewan wekî mêran hev şiyar bikin. Ew neyar û dujminê ku li ber derê me sekinîye nîyeta wî kujtîn û qelandina me ye. Nîşanê hev bidin çare û felata xwu daynin ber xwu.

Wext gelek teng e, wextê seknê nîne, wextê mêranî ye, wextê yek-bûyinê ye. Wextê bi hev girtinê û wextê de'va û kîne nîne.

Eger furseta ha bifewtî êdî furset bidest me nakevî, musulmanî û em diçin, gelî biran rabin xîreta bav û bapîran bipakin, cilê(kincê) jinan li xwu mekin.

Şîn û girîn, mirîyan ji qebran ranake, we zar û gazî tiştê borî paş nazivirînî.

Bi xem xwarin belâ def nabî. Selameta mirovan bi sebir û sebatê, bi nîşandana xîret û hîmet e.

Tirs ecela mirov paş nade, bê himmetî û xeyretî sebebê felakete.

Quran'a kerîm ne mirî ye wê heya edeb dê bijî ewê ji xwera bikin hakim bi hukmê wê emelkin. Hêvîya min heye ku birayê di me yê musulman ji alim û

ji xelkê hatî û çûyî îbret bigirin, ber wextê borînî yek dil û yek ziman bibin, ew kîn û dijminî ji dilê xwu derxin, musulmanî roj bi roj bilind bibî û ji qelandinê xelas bin.

Şêx û Mela û Mîr û Rîsipîyên dime rêberî û hîmmeî bila bikin, em nizanin ew zana ne û Xuda ji kî hez bike wî hîdayet dike, ji berê û paşî emr (îş) di dest Xuda da ye.

Şêx Muhammed Abduhu
(Miftîyê Misrê)
13 Temmuz 1329
M.... H...

ZIMAN

Xudayê Tala “mirovan” ji “dewaran” bi ziman û aqil veqetandiye. Ziman ji bo gotin, guh ji bo bihîstin, çav ji bo dîtin daye.

Ew mirovê ku aqilê wî hebe tefekkûra qenc û xerabî neke, zimanê wî hebe pê xeber nede we derdê xo pê nebêje, guhê wî hebe emrê Xwuda we Nebî û mezinan seh neke, çavê wî hebe ew alem û ew sen’etê ecêb, ew avayê bilind, ew mektebê di mezin wî nebîne, ji bo xwe, ji bo jin û zaroyê xwe tefekkura tişteki neke, ew mirov dunya û axretê de kor e, bi kêrî tişteki nayê, ferqa wî û dewar tune. Mirov ew mirov e ku daîma xelq ji wî xêrek, bergerek digire, mirovê bêxêr û bêberge heyîni û tune. Mirovê wî yek e.

Îro di rûyê erdê de nêzikê şeş mîlyon kurd heye û hemû bi aqil in, bi

guh in, bi çav in. Li ba mileta xwe, xasime ji bo misilmanîya xwe bi zimanê xwe çend kitêb nivîsandine, çend mekteb û medrese vekirine, çend zaro li ber xwendinê danîne, çend Mele û Feqîyê me rabûne li gundan gerane ji bo misilmanîya wan şîretan kirine, çend Mîrê me, çen serekê me civiyaye ji bo xo û ji bo miletê xwe fikrek kirine, çend Şêxê me ji bo îttîhadê Kurdan civiyane, çend eşîran bi hev xistine adetê kuştin û talanbirin ji nav wan rakirine, zaroyên di wan şîyandine mekteban.

Mezinê di Kurdan ji bo xo û ji bo mileta xo, di nav miletê wî çî cî hazir kirine, îro di nav xelqê de rûmeta wan çîye we bav û kalê wan çer kirîye ewê dê çî bikin, yan dê kurdejarîyê heya roja qîyametê di vî halî da bihêlin.

Ya rebbî tû qadir î! Rehmek bixî dilê Şêx ê Mela û Mîr serekê Kurdan, rabine pîyan berxwe bidine şîyar kirina wan.

Ey Xuda tû kerîm î! Bi kerema xwe van kurdên nezanê şîqar ji dest dijminan xelas bike. Îro sêsed mîlyon misilman heye hemî bi rê zimanê dixunin û dinivîsin, tu zîyanek ji bo dînê xo ferz û tesewur nakin. Ji bo pêş çûnê çî lazime ew îcra dikin, em jî lazime tebayê wan bin îro pêve bi zimanê xo bixunin we biniwîsin. Çend Feqeyê Kurdan xîreta kurdanîyê di wan da peyda bû, rabûn çûwana “Hêvî” çêkirin, paşê rojnama “Rojî Kurd” der xistin ji dil û can dixebitin, lazime kû hun jî arîyê wan bikin. Ev arîkirin li we ferze, wacib e, bê arîkirin dunyayêda tişteki nabî.

Ewê Kurd e, ar û namûsê xîretê kurdîyê têda heye we ji tenê dost û dijminan diqehire, şerm dike bila arîyê wan bike!

Ev arîkirin jî qisim qisim e, hinek bi qelesa xwe, hinek bi îlmê xwe hinek bi malê xwe. Temamê wî arîkirinê jî bo pêşçûna Kurdan e, ji bo mirovbûna wan e.

Kurd îro muhatacê çî ne, em ewan bêjin:

1. Ji bo xwendin û nivîsandinê hîref. (dibe kû ev kelîme “hîref” be jî bi mana sen’etê-werg.).
2. Ser terzek nû elîfbayek.
3. Ji bo zanîna temamê zimanê Kurdîtiyê “qamusek”(luxatek).
4. Îlmî halek.
5. Tarîxê bav û kalê Kurdan we an’ane ya (kultura-çev.) wan.
6. Welatê Kurdan we adet û teb’ê wan we mîqdar û navê eşîran.
7. Kitêbê hîsabê.
8. Ji bo zimanê Kurdan serf û nehvek (rêziman-çev.)
9. Tercumeyê halê mezinê di Kurdan.
10. Edebiyata Kurdan we navê şairê wan, ji bo çêkirina van tiştan çiqas kitêbên kurdî heye lazime wan bişînin. Ji dengbêjan lawjek û çîrok û qewlê Kurdan(gotinên pêşîyan) pirs kin we binivîsin we rêkin. Mela û Feqehê di Kurdan çî dizanin bila bêjin. Tû tewsîratek tê nekin, herkes di terafê xo da xizmetek bike, zû bi zû mirov digîhe xerada xo. Gelî biran ji we hêvîya min ewe kû xizmeta kurdîtiyê û misilmanî neavên pişt guhê xo, misilmanî ji we hêvîya xizmetê dike.

15 Temmuz 1329

M. X.

Erdê ê Me

Îro xurtbûnê me, mezinbûnê me, mirov bûnê me, giş li rûyê erdê me de ye. Ew erd ji bav û kala da ji me ra hatîye, baş fikirin kû li rûyê wî çî bûye, ew hêja nefa xwe ji me ra nedaye. Em dinêrin balê ew erdê ew ya komelek xwelîye ew çîye em dibên:

Rastîya wî hûn bixwazin ne wusaye, ew erdê me dîya me ye, ew erdê me bavê me ye, yalê em nizanin nava wî da çî heye, çî tûne. Hebûna wî ji me ra xwanê nebe, tunebûna wî ji me ra xwanê be tû car ne wusa ye. Heke em li wî baş binêrin, ew jî ji me ra baş dinêre, me xurt dike, ji me ra çî bê bide. Ewd ewel hûn dizanin kû xwarina me ji erdê derdikeve, ew parîyê nane ewî dîsa ji me ra erd dide. Ew me xwedî dike, belê em wî xwedî nakin. Îro kolandina erdê me ne kolandin e, çêtirkirina me ne çêtirkirin e. Em zûda hemû li ser wî dikolin li binîya wî ra destê me nagîje, başê wî li binî dimîne hersal. Hersal ew serî ji me ra ewqas tov dide fayda wî qedyaye. Lewma em hindik distînin. Em zanin şûv çêkir bi nedaşî gîsin çêtire, ji du gîsnî, du gîsnî jî başe ji gîsnek.

Ji bo wî ew zorê hilandine. Makîna çêkirine, bi carekî da xwelî tol dike. Xwelîyê kî ji binê erdê tol dike, serê wî jî davê li bin, lewma kolandina makîna baş dibin. Genimê wî jî baş dibe, xurt dibe.

Dê û bavê meriv jî ewqas mirov xwedî nake, belê wûsaye erd. Bavê me ye, dîya me ye, çawa mirov ji bav û dîya xo ra bixeyde, Xuda jî ji mirov

dixeyde. Em erdê xo ra jî wûsa ne, kû lê şuxul nekin ne nêrin wî erdî dê ji dest me derkeve, fileyan li ser me rûnên we(û) bişeqlînin wek xulamê bavê wan dê we bixebitînin.

18 Temmuz 1329
Dîyarbekirî
Fikrî Necdet

Berî Şûr Qelem

Ne muhtacê îzahê ye kû mexsed ji qelemê ilm û me'rifet e. Min divê ji qewmê xwe ra bêjim; tû qewm û millet li dinê nîne bi şûr û mertalê xo tenê gîhabin meqsedê, xo hilkişe jor, îlla bi ilm û me'rifetê. Ilm û me'rifet dû perrên we ne, mirov bi wan dikare bifire û derkeve bilindayî. Xudayê xellq ji însana ra emir kirî, bê wî nabe. Şahidê min ê mezin ji wê du'ayê ra kurmacîti ye.

Ji roja îslamiyet zuhûr bû hetta îro, her mêrê Kurda li nav şerra bezîne, pêşda çûne we tû cara xo nedane paş we her li rêya dînî û dewletî xo de fedekarî kirine û ruhê xo dane. ... Lê heyf e û hezar heyf e jî tû car wan ji wê hîmmeta tû xêr û menfe'et nedîye we nexwarîye. Her timîn ruhdana me ye ji xeyrê me ra ye. Ew zerara mezîni her ji cehl û nezanîya me hatîye, heke qencî be, heke xerabî be mirov bicih neke, ye'nî nezanîyê çewa bike, ew tû xeyr û nefê jê nabîne. Me Kurd jî her weha kirîye, me nizanîye me li kû we li çî demê ruh bidinê, û li kû derê we li çî

demê ruh bişînin. Lewma her em bûne we mane xulam.

Heke me qenc bifikirya, ehkamê dînê xo yê bilind û mezin me yê bidîta ku tehsîla ilm û me'rifetê ji me muslimanan ra ferze, li dîn û duewlê nef'e bi Xudayê xellaq, nev'ê beşer bi ilmê tekrîm kirîye, wekî ruhê wa Hezretî Adem berîya qedere wî bi ilmê bilind kir, dema kû kire zana ji melaîkan ra emir kir li ber wî secde bikin. "Giştî navan bi Adem dan zanîn ayet".

Ewle ya min heye kû ji îsbata vê de'vayê ji kurmacîti meztir we bi rutir tune, em Kurd jî bi wî qanûna Xuda ya heyatê qenc negerîni em tu car pêşde naçîni, emê her paşve bin. Hetta mirinê xulamîyê ji kes û nakes re bikin, meazallah qewmê xo û navê xo dê wenda bikin.

De êdî gelê birayên me Kurdino! Çavê xo vekin we bi ewle bin, em heke wê qanûna ezeli xurt negerîni we ji bil ruh û dilê bilind bînîre ne xebitin, nefis û qewmê xo ji wê zilletî û xesarî hilnekinî, dîn û dinya xo jî qenc û tamam nakin. Şîretên qenc û xeberîne rast hingê li me tal bît. Divê em tû caran dilşikestî nebin.

Îro li dinê nêzikê heft-heşt milyon Kurd hene û hemî mêr û jêhatî ne û xo xweyî weqarin. Lê heyfa min li wan tê her li bende mane, ji wan ra bilindî nebûye nesîb, çunkî bê tedbîr in, tedbîr jî zanatî ye. Heçî ne zana bît tedbîra wî jî ne bi cîh e û ne bi cehd e û ne xurt e, her ê wûsa kême û zelif bibî, di nav alemê da bê nav û deng bibî.

Xesara ya me, ji wê têt. Me her ji bê ilmê pişt da şûr û mertal ji eql û keyaşî bêtir. De êdî heke we divê em xo ji wê zîyanê derêxin û bikevin nav alemê de, divê em îltîfatî li ilmê bikin, qedre alim û zanayê xo bizanin, guh

bidinê şîretên wan, arî xebitandina wan bikin, hetta em rêya qenc bibînin we têkevin, zû, bilez xo bigehînin selametê.

Hûn dizanin gelfî Kurdino!... Çiqas alim û xwenda, şaîr û mêrîniyê mezin û çî hatî ji me jî derketine? Lê her me navê wan ne girtîye, qedrê wan ne zanîye, ew jî her ji kurdaniyê der ketine, qewmê dêreman e.... Alimên qedirmezîn wekî Şeyhûl-Îslam Ebussuud, Melayê Cezîrî, Melayê Goranî (xocê Fatih bûye), Herîrî, şairîne mezin wekî Nalî, Herîqî, Kurdî, Ehmedê Xanê, Şêx Riza, Hacî Qadir, dîrokzanê meşhur Ibnu'l Esîr, Ebu Elf hemî ji kurmançîyê hatine û Kurmancan tû car wan nas nekirine.... Tarîxek me nivîstî tune. Şerma mezin jî ew e. Bilî wan mezinan mirovekî di mezin û jêhatî weke Sultan Selahaddîn Eyyûbî ji me ye û sed heyf bête li me wî nas nakin.

Dinya, alem, hemû Îslam pê îftîxar dikin: Heke em ji navê wî bê ilm û xeberin, ew Selahaddîn kurdîyeyî ra hindî xizmet kirî, Îslamê ji îngîrazê xelas kirî, bi fetha Qudsê bûye Omerê sanî(duyemîn). Xo bûn xaçperesa xo kirne yek û xo jî bûne yek/ dihatin bi zaf ba cara re Qudûs jî ... Ew welatê muqaddesê îslamê jî, ew welatê mescîdî Eqsa me lê zeptkirin.... heft sala têda man. ... Selahaddîn hat we bi jêhatin û mêranîya xo ji dest wan bir, roja îne bû ketin bajar da hema çûbûn Mescîdî Eqsayê nimêjê îne bikin. Bifikirin ew cihê pak û delal xera bû, wêran kirine, qedeh û şûşeyên şeraba wan hê li wan deran avêtibûn. Hesp û dewarê wan li wê derê girêdayî bûn. Xulase zaf heqaret kiribûn. ... Qadîyê Sultan, Qadîyê fazil derket minberê xutbe kir. Lê pîr dilşikestî we melul xwend. Xutba wî menzum we serê

beyta wî ev bû: *Elhamdulillah zellet devletü's salî bi/ We azze bîlkurdîyyî dînu'l Mustafa'l arabî*. Yanî hemd û şîkur ji wî xudayî ra dewleta xaçê zelîl kir we bi kurdekî dîne Mustafayê Ereb ezîz kir. Qene texmîn bikin ew çî xizmetek mezin û ezîz e ji dîne Îslamê ra: Ewê xizmet kirî Kurd e. .. Yek wekî wî zatê mezin kû şerefek mezin ji qewmê me re hiştî em nas nekin, emê çî xêrê ji wî hebûna xo hêvî bikin: Ew qusurîne han jî çine hûn dizanin? Hemî ji bêilmî û me'rîfeyî ye kû tarîxek me Kurdan nîne, ji bilî alemê em xo bi xo nas nakin û em ji xo û ji quwweta xo xafilîn. De êdî xelkê ne ji me ê çawa me nas bikin û li nav xo de nav û dengêkî ji me re çêkin û an bihêlin.

Ji bê tarîxî xusara me zaf mezin û zaf xurt e, divê em bixebitin we demê tarîxek Kurda çêkin.

Paş tarîxê tiştêk dî heye ew jî fesarek mezin daye me rojnave (rojname).

Ez qenc dizanim kû nûho zaf Kurd dê bêjin rojnave çîye û ji me re çî faîde dike, ez piçek îzah bikim.

Mirov çawa ziman divê we bi zimanî her karî xo dike we çî divê û bêje rojnave jî aynen weye. ...Heçî qewmê ku bê tarîx û bê nivîsandin û rojnave ye.... Ew qewm wekî însanekî kerr û lal e... ne seh dike çî behsa wî dikin, ne ew xo jî dikare derdê xo bêje û kesek jêre dermanekî bîne.

Hindî qewm û millet hene, her yekî çend rojnave hene, bi wan derdê xo ji alemê û ji hûkumetê ra dibêjin we îlan dikin, derman jî dibînin. Heke ew millet (derdê wî) sivik be zû jî sax dibin. Ya me jarî Kurda ne weye, ne kes zane derdê me çîye dermanekî bide, ne em dikarin derdê xo bêjin û dermanî bixwazin. Lewma jî ji derdê cehl û

nezanîyê û ji ne rahatîyê û cefayê xilas nabin.

Heke em û heke Fille em du millet in bi welatekî ne ew ji me zaf hindik û kêr in, em ji wan jî xurt û mêrxas in. Lê îro li ber hemî alemê binavên dunya giştêk dizane kû ew xudanê wî welatê ezîz in, dibêjin qey mezlûm in û her Kurmanc te'dayê li wan dikin, hetta here li Îstenbolê de jî hemî dîndaşê me jî li wê fikirîne, Kurda zalim, wehşî nas dikin. De ji wê kêmanîyê ye rojnave ji Kurda her dengê xo derne-anîye, de'va û îsnadinê li ser xo tekzîb nekirîye. Ên li halê mêze dikin jî, deng lê nekirinê ji eddê îqrarîne zan kirine û em wûsa naskirine, xo ji wî naskirina ji me re zerer û xerabî dane alîyek, me ji ew zererîne ha dîne, hê emê bibînin. Jiwan hemî pirsê me bin, hema ew tarîxek, rojnavekî çêkin emê xelas bin, ne ...

Ez nûho wan tenê dibêjm, çikû ew tiştên zû lazim in. ... An da em bibin xweyî heyatek zaf baş û xurt divê em gelek bixebitin û zaf bixwînin. Zaf mekteba vekin, xo bikin xweyî sen'et, ticaret, cotyarî û li hewayê zemanî hazir çêkin, da milleta me bi dewlet bibe...

Lê zaf adetên pak û çak li kurdanîyê min dîtine we ez dibînim bi wan ewleyim û ez dibêm bi îzna Xwedê emê rind baş bibin. Hema hûn gelê Kurdino! ... Guh bidin alim û zana û mezinê xo, li hemî meqsed û alî xêr arîkirîyê wan bin... Xwedayê Teala wê şerefa ezîm li dîn û dunyayê ji we re îhsan bikit we bi wê munasebetê ezê qesîdeke ya Hezretî Şêx Ehmedê Xanê ji we re binivîsim. Ev kafîye, heke hûn reşnew bi dil bixwînin we bidin xwendin, heke ew qesîde û heke qesîda Hacî Qadirê Koyî, birayê min ê ezîz we pur xîret(Meweddatî) li Rojî Kurd da

wêha borî nivîsî bû... Divê her Kurdek wan bi tenê hifz bike... bîrîtî ye we evîn şûna sitrana her wan bixwînin... Ew dû qasîdeyên her nûqteyek ji wan ji me Kurda ra rûh û heyat e... Ji me şîret û ji we jî ey gelê Kurdino! Xebat û xîret... Ji xwedayê zu'lcelal jî tewfîqat ê mezin(arîkarî).

M. Salih Bedirxan

Qesîda Hezretî Şêx Ehmedê Xanê

*Sakî tû ji bo Xwedê kerem ke
Yek cure-î mey di camê cem ke
Da camê bi mey cîhan numa bit
Her çi me îradete xuya bit
Da keşfê bibit li ber me ehwal
Konê dibitin muyesser îqbal
Edbara me wê gîha kemalê
Aya bûye qabilê zewalê
Ya her wuha dê lê îstîwa bit
Hetta we kû dewrê munteha bit
Qet mumkune ev ji çerxê lewleb
Talî' bibitin ji bo me kewkeb
Bextê me ji bo me ra bibit yar
Carek bibitin ji xwabê hişyar
Rabit ji me ji cîhan penahek
Peyda bibitin me padîshahek
Şûrê hunera me bête danîn
Qedrê qelema me bête zanîn
Derdê me bibînitin îlacê
Îlmê me bibînitin rewacê
Ger dê hebûya me serfirazek
Sahib keremek suxen newazek*

Neqdê me dibû bi sikke meskuk
Ne dima wûha bê rewac û meşkuk
Her çendî kû xalis û temîz in
Neqdên bi sikke û ezîz in
Ger dê hebûwa me padîşahek
Laiq bidîya xwedî kulahe
Te'yîn bibûwa ji bo wî textek
Zahir vedibû ji bo me bextek
Hasil bibûwa ji bo wî tacek
Elbette dibû me jî rewacek
Xemxwarî dikir li me yetîman
Tînane derê ji dest Leîman
Xalib nedibû li ser me ew Rom
Nedibûne xerabê destê bûm
Mehkum aleyhî û sealîk
Mexlub û mutî-î Turk û Tacîk
Ev Rom û Ecem li ser me rakir.
Emma ji ezel Xwedê wusa kir
Tebîetê wan eger çi are
Ew are li xelqê namîdare
Namuse li hakim û emîran
Tawan çî ye şair û feqîran
Her çi bire şûrê destê hîmmet
Zept kir ji bo xo mîrî û dewlet
Lewra kû cîhan wekî erûs e
Wî hukmê bi destê şîrê Rûs e
Bê eqd û sîdaq û mihr û kabîn
Lutf û kerem û ata û bexşîn
Pîrsî ji dinê min ev bi hikmet
Mihra te çi, gote min kû hîmmet
Hasil kû dinê bi şûrê îhsan
Texîrê dibit ji bo wî însan
Ez mame di hikmeta Xwedê da
Kurmancî di dewleta dinê dinê da
Aya bi çi wechî mane mehrum
Bilcumle ji bo çi bûne mehkûm
Wan girtî bi şûrê şehîr û şohret
Texîrî kirin bîladê hîmmet
Her mêrekî wan bi bezlê Hatem
Her mêrekî wan bi rezme Rustem
Bifîkrî ji Ereb hetta we Gurcan
Kurmancî ye bûwe şûbhê burcan
Ew Rom û Ecem bi wan hesar in
Kurmancî hemî li çar kenar in

Herdu terefan qebîlê Kurmanc
Bo tîrê qeda kirine amanc
Goya kû li ser heddan kilîdin
Her taîfa seddeki sedîdin
Ew qulzumê Turk behrê Tacîk
Hindî kû bikin xurûc û tehrîk
Kurmancî dibin bixwûn mulettex
Wan jêkve dikin mîsalê berzex
Camêrîy û hîmmet û sexawet
Mêranîy û xîret û celadet
Ew xetme ji bo qebîlê Ekraç
Wan dane bi şûrê hîmmetê dad
Hindî ji şecaetê xeyûrin
Ew çendê ji minnetê nufûrin
Ew xîret û ew uluwwe hîmmet
Bû maniê hemlê barê minnet
Lew pêkve hemîşe bê tîfaq in
Daîm bi temerrud û şî'raq in
Ger dê hebûwa me ittîfaqqek
Vêkra bikira me îngîyadek
Rom û Ereb û Ecem temami
Hemyan ji me ra dikir xulamî
Tekmilê dikir me dîn û dewlet
Tehsilê dikir me ilm û hikmet
Temyîzê dibûn ji hev meqalat
Mumtazî dibûn xudan kemalet

M. Slaih Bedirxan

Bextreşî û Mehrûmîya Kurdan

Şêxê di me, Melayê di me, feqîyê di me, mîrê di me, serek û reîsê di me îro ji dil dizanin, di pê dihisin kû çaralîyê me agirek girtî ye, qenc û xerabê me di şewitin li hewar û gazîya me da kes naye, me xelas nake.

Bila ew rabin, dest bidin hev xudanî li me perîşan, li me derbederan, li me mehruman bikin, me ji wî agirê bê eman xelas bikin, rêya felaketê nîşanê me bêçareyan bidin. Hûkmê Ayetê Kerîm “Ehsîn kema ehzenallah û îlek”(qencî bike, çawa Xudayê Teala qencî bi te ra kiriye) derheqê me da îcra bikin.

Ez guman nakim kû mezinê di me xîret û hîmmeta xo, rehm û kerema xo ji me derix bikin(paşve bihêlin). Me divê zelilîya ha da bihêlin. Ez bawer nakim kû mezinê di me ji bo pêşçûna me, ji bo mirov bûna me her çi a dest wan bê paşve bidin.

Feqet dilê pur derdê min ji mi ra dibê kû ew cûz kû tû dibêjî eger rast bû ya heya nûha yek ji wan jibo xatirê Xwedê û Nebî li kurdîyê xweyî xwudanî di Kurdan li ser rêyek dataniya heya mehşerê navê xo di bernawê tarîxan dikir.

Rehmata Xuda lê bî: *Ehmedê Xanê* sêsed sal berê da binêr çi gotîye:

*Kurmnacî ne pur dê bê kemal in
Emma di yetîm û bê xudan in
Fîlcumle ne cahil û nezan in
Belkû sefîl û bê Xudan in
Ger dê hebûwa me jî xudanek
Alî keremek letîf û danek
Îlm û huner û kemal û îzan
Şe'r û xezel û kitab î dîwan
Ev cinsî bibûwa li ba wî me'mul*

*Ev neqdê bibûwa li nik wî meqbul
Min dê elema kalamê mewzun
Bilind bikira li banê gerdûn
Bi navê ruhê Melê Cizîrî
Pê hey bikira Elîyê Herîrî
Keyfek we bida Feqîhê Teyran
Hetta bi ebed bimayî heyran
Çibkim kû qewî kesade bazar
Nînin ji qumaşê ra xerîdar.*

Îro li rûyê erdê da çiqaş dewlet û millet hene hemî yek dil, yek rû, yek ziman, bi şev û bi roj dixebitin û bona pêşbûna dewlet û milletê xo her çi ji dest wan tê dikin. Bo nanê xo dixwunin û dinivîsin, rojnava der dixin, her çi lazim be dinivîsin, bi xelqê xo didin zanîn, bi çi muhtac bin heman ew gav bi destên mezin kû di nav wan da be gihê û di rêya milletê xo xîzmetek çak bike di tarîxê xo da qeyd dikin, navê wî bîrve nakin.

Ez berê berê nabêm; îro hezar û sêsed sal e kû Kurd(me) qebûlê musulmanî kirine di nam û xebatê ha da qe nebî sî çil hezar şêx, mela û feqî û mîr ji Kurdan gihane û di wê wextê da navdar e, ji bona dîn û dewlet xîzmetê mezin kirine û kitêb çêkirine. Hal eve kû ev xîzmeta ha, ev kitabeta ha temamê wî wenda bûye, navek wan nemaye, ewê maye ew jî malê Ereban û Eceman û Romîyan bûye, qederî zillek ji bo Kurdan faîdeyek ne kirîye.

Eger wan mirovan ji sedan yek xîzmetek ji bo Kurdan bikiran û ewan kitêban û dîwanan bi zimanê Kurdî binivîsandana, îro da navê wan û kitêbê wan wenda nedibû, zarokê di Kurdan dixwendin û rehmetan li wan danîyan.

Eva mîsala *Elîyê Herîrî* ye nehsed û sî sal berê hatîye bi zimanê Kurdî beyt gotîye, heya heşr rabî navê wî li wan Kurdan dê bimînî, herkes rehmet dê lê

bînî. *Melayê Cizîrî* jî heştêsal sal berê da bi zimanê Kurdî dîwanek çêkirîye.

Ehmedê Xanê, Mem û Zînek û ji bo zaroyê kurmancan *Nûbarek* telif kirîye, bi çar ziman şê'r(şîr-çev) gotîye, der heqê xîreta Kurdî da çend xeberek *Mem û Zîne* da anîye û ji ebnayê zeman(rewşa zeman-çev.) gelek gilî kirîye:

*Xanê ji kemalê bê kemalî
Meydana kemalê dîtî xalî
Ye'nî ne ji qabil û xebîrî
Belkû bi teessub û eşîrî
Hasil ji înad eger ji bê dad
Ev bîd'ate kir xellaqê mu'tad
Safî şemirand vexwarî derdê
Manendê dûrrê lisanê Kurdî
Înaye me nezm û întizamê
Kêşaye cefa ji bo wê amê
Da xelqî nebêjin kû Ekrad
Bê me'rîfet in bê esil û bunyad
Enva'ê millet xudan kitêb in
Kurmancî tenê di bê hesêb in.
(dawî heye)*

M. X.

Çîrokê Kurmanca

Di wexta berê da, wexta emîrê Kurmanca da şivanek pezê xu diçêrand. Di nav bestekî da xewa wî hat rûyê xu wergerand ber bi bajarê kû emîr têda rûnişt: "Mîro pezê xu dispêrim te û radikevim" û raket.

Çaxa kû hişyar bû pezê xu jimart çend pez kêmbû. Li nav çîya gerya, şopa pezê xu dî kû gura xwarîye.

Kerîyê xu da ber xu hat ber qesra mîrê mezin û çû ramîsa lingê mîr, go: "min li çolê kerîyê xu sipart edaleta te ez raketim, çaxa rabûm mi pezê xu jimart pênc pez gura xwarîye, ez nûka pezê xuna ji te dixwazim." Mîr gilîyê wî guhdarî kir pênc pez da şivan.

(Mîr) go: Şivano! Çend sekmanê min ê emirgîrî bila dû te bên, çîyayê kû tu lê raket rê wan bidî bo wan ra li gura bigerin.

Şivan çû ji sekmanê Mîr çendek eciband, bo xu ra bir li wan çîya û newala geryan, çend gurê har dîn û kûştin.

Şivan pezê xu jî girt, gura jî kûşt, mîrê wê wextê jî bi wî holê xu mezin û edaleta xu rê şivan da.

"Kellîmî'n-nase ela qederî uqûlî-hîm" (Hadîs) "Bi gora eqlê mirovan, bi wan ra bi peyvin".

Mehmûd Beg metbeesî.

Mudirê Mesul: Ebdulkerîm

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org